کوردستان وڵاتی
ڕەنگ
گۆرانی
دڵنەرمی







# ڕێبەری گەشتیاری پارێزگای کوردستان

بەشی گشتی میراتی ڕۆشنبیری و
گەشتوگوزار و کاری دەستی
پارێزگای کوردستان



## بانە ـ دارستانی ئارجان

دەق: ئاوات مۆکاری
دیزاین: سۆهراب ئارام
وێنە: ئەرشیفی میراتی کولتووری

## هەڵکەوتەی جوگرافیای پارێزگای کوردستان




پارێزگای کوردستان بە ڕووبەری ٢٩ هەزار و ١٣٧ کیلۆمەتری چوارگۆشە لە بەشی ڕۆژئاوای ئێران کە لە ڕۆژئاواوە هاوسنوورە لەگەڵ عێراق (پارێزگای سلێمانی لە هەریمی کوردستان). سەرەڕای توانا سروشتییە گەورەکەی، ئەم پارێزگایە زیاتر بەهۆی بوونی پتانسێل ڕۆشنبیرییە بەهێزەکانی وەك: زمان و جلوبەرگی کوردی ،میوانداری تایبەت بە خەڵکی کوردستان، پتانسێلە بەهێزەکانی مۆسیقا و گروپی هەلپەرکی (سەمای کوردی)، بۆنە کولتوورییەکان و هەبوونی نزیکەی ١٠٠ گوندی گەشتیاری ،ناوچەی تۆماری جیهانی هەورامان و هەبوونی کاری دەستی ناوخۆیی و ناوازە زیاتر بە پارێزگای کولتووری دادەنرێت.

پێویستە بگوترێ مێژووی شارستانیەتی ئێران لە مێژووی مادەکان دەستی پێکرد کە باپیرانی ئێستای گەلی کوردن و ئەمەش ڕەسەنایەتی ناوچەکە و مێژووەکەی زیاتر دەکات. سنە ناوەندی پارێزگای کوردستان کە لە لایەن یونسکۆوە وەك شارێکی جیهانی مۆسیقا تۆمار کراوە، بە دووری ٤٨٥ کیلۆمەتر لە تارانەوە هەڵکەوتووە. بە پێی سەرژمێریی گشتیی ساڵی ١٤٠٠ی هەتاوی، ژمارەی دانیشتووانی ئەم پارێزگایە یەك ملیۆن و ٦٦٥ هەزار و ٩٠٠ کەس بووە و شاری سنە کە ناوەندی ئەو پارێزگایە بە ٥٢٨ هەزار کەس دەخەمڵێندرێت.

## شاری سنە

شاری سنە بە ناوەندی پارێزگای کوردستان و ناوەندی فەرهەنگی ناوچە کوردنشینەکانی ئێران دادەنرێت. سنە بە شاری هەزارتەپەش ناسراوە، شاری سنە لە لایەن بنەماڵەی ئەردەلان لە سەردەمی دەسەڵاتی شانشینی سەفەوی بە سەر ئێراندا دامەزراوە ، ئەم شارە تەمەنی ٤٠٠ ساڵە، بە هۆی ناوەندگەرایی لە ڕابردوودا، سنە زۆرترین شوێنی سەرنجڕاکێشی گەشتیاریی وەك مزگەوت، باڵەخانە و بازاڕی کۆنی هەیە. سنە بەهۆی توانا گەورەکەی و جۆراوجۆری چالاکییەکانی پەیوەست بە مۆسیقا لە ساڵی ٢٠١٩ لەلایەن یونسکۆوە وەك شارێکی داهێنەرانەی مۆسیقا ناسێندرا.





## بازاڕی سنە

ئەم بازاڕە دەکەوێتە هەردوو دیوی شەقامی ئینقلاب و تەمەنی ٤٠٠ ساڵە و لە هەمان کاتدا لەگەڵ ناوەندگەرایی شاری سنە وەك ناوەندی حکومەتی ئەردەڵان دروستکراوە.

پلانی ئەم بازاڕە لە شێوەی لاکێشەیەکی گەورەدایە، کە بە هۆی دروست کردنی شەقام لە سەردەمی پەهلەویدا بۆ دوو بەش دابەش بووە و بەشی باکووری ناوی بازاڕی سەنەندەجی و بەشی باشووریش بە بازاڕی ئاسف ناوزەد کراوە.

## مزگەوتی ناوەندی سنە

(مزگەوتی دارالاحسان) ئەم مزگەوتە دەکەوێتە لای باکووری شەقامی ئیمام خومەینی، مزگەوتەکە لە سەردەمی قاجار (نزیکەی ٢٢٠ ساڵ لەمەوبەر) دروستکراوە.
لە نێو تایبەتمەندییە تەلارسازییە جوانەکانی ئەم مزگەوتەدا دەتوانین ئاماژە بە کاشی جوان و ڕەنگاوڕەنگی مزگەوتەکە بکەین لەگەڵ ناوەندە گەورەکەیدا.





## ماڵی کورد (کۆشکی ئاسف)

ماڵی کورد، مۆزەخانەی ئەنترۆپۆلۆژی ناوچە کوردنشینەکانە و گەورەترین مۆزەخانەی ئەنترۆپۆلۆژییە کە پەیوەندی بە عەشیرەتێکەوە هەیە لە ئێرانا، دەکەوێتە سەر شەقامی ئیمام خومەینی لە شاری سنە. ئەم مۆزەخانەیە لە کۆشکی ئاسف هەڵکەوتووە، ئەم کۆشکەش یەکێکە لە گەورەترین کۆشکە ئاغاکانی شاری سنە کە لە ڕووی خشت و گچکەییەوە بەهای تەلارسازیی تایبەتی هەیە و لەم خولانەی دواییدا تەواو بووە.





## کۆشکی خه

(کۆشکی مۆزەخ

ئـــەم کۆشـکـــە و
دەکەوێتـە شـەقامی
کـۆشکەکە لـە جـۆ
ناوازەیـە و تەمەنی
ساڵە و ساڵانێکی ز
حکـومــەتی فـەرما
ئـەردەڵان بـووە. ئـەم کۆشـکـە
شـوێنی نیشـتـەجێبونی شاعێر و
مێژوونوسـی بەناوبانگـی کـورد
خاتـوو مەسـتورەی ئـەردەڵان
بـووە.



## کۆشکی موشیردیوان

ئەم کۆشکە دەکەوێتە شەقامی شۆهەدا و حەوت حەوشەی تێدایە لەگەڵ شوێنی پەیوەندیدار و حەمامێکی تایبەتی هەیە لەناو کۆمپلێکسەکەدا. هەروەها هەریەك لە حەوشەکان نافورەیەکیان هەیە و جوانترین پەنجەرە بە دیزاینی کڵاوفەرەنگ لە شاری سنە هی ئەم بینایەیە.

# کۆمەڵگەی پارکە گەشتیارییەکانی ئاویەر

لە ڕۆژئاوای شاری سنە و لە کۆتایی شەقامی ئاویەر هەڵکەوتووە. شاری سنە لەم پارکەوە دیمەنێکی زۆر جوانی هەیە. یەکێك لە گەورەترین باخچەکانی ئەم کۆمپلێکسە باخچەی ئەمیرییە و گەورەترین سینەمای دەرەوەی (هاوینی) لە وڵات و ڕۆژهەڵاتی ناوەڕاستدا دەکەوێتە ئەم باخچەیە. پردی هەڵواسراو و کۆمپلێکسی هێڵی زیپ لە سەرووی پارکی ئەمیریە لە سەرنجڕاکێشترین شوێنەکانی دیکەی ئەم کۆمپلێکسەیە. هەروەها بەرزترین پەیکەری وڵات بە بەرزی ٢٢ مەتر وەك هێمایەك بۆ بەرگری کردنی گەلی کورد لەسەر یەکێك لە گردە بەرزەکانی ئاویەرە . باخچەی ئێرانی و پارکی بەناوبانگانی کورد شوێنە سەرنجڕاکێشەکانی تری کۆمەڵگەی پارکی ئاویەرە.





## قەڵای دێرینی زیویە

قەڵای دێرینی (کۆشك)ی زیویە دەکەوێتە سەر یەکێك لە چیا تاڕادەیەك بەرزەکان، بە دووری ٥٥ کیلۆمەتر لە باشووری ڕۆژهەڵاتی شاری سەقز، لە گوندی زیویە و نزیکەی ٧٠٠ ساڵ پێش مەسیح لە سەردەمی حوکمڕانیدا هۆزی ماد و مانایی‌دا دروستکراوە. زیویە لە ڕووی تەلارسازی و بەرهەمە هونەرییەکانەوە بە یەکێك لە شوێنە هەرە گرنگ و بەنرخەکانی سەردەمی مێژوویی دادەنرێت.



## ئەشکەوتی کۆنی کەرەفتوو

ئەم ئەشکەوتە دەکەوێتە ٧١ کیلۆمەتری لە باکووری شاری دیواندرە. ئەشکەوتی کەرەفتوو بە ی
لە جوانترین و گرنگترین ئەشکەوتە سروشتی و دروستکراوەی دەستی مرۆڤ لە ئێران دادەنرێ
لە ٤ نهۆم و لە دڵی شاخەکەدا هەڵکەندراوە. بەهۆی بوونی نوسراوێکی یۆنانی لەسەر دەرگای ی
لە ژوورەکانی نهۆمی سێیەم پێی دەوترێت پەرستگای هێراکلیس. ئەم ئەشکەوتە گرنگترین ش
سەرنجڕاکێشی مێژوویی پارێزگاکەیە . کە بەهۆی نزیکی لە شوێنە مێژووییەکانی دیکەی وەك ق
دێرینی زیویە و کۆمپلێکسی مێژوویی تەخت سلێمان پێگەیەکی تایبەت و ناوازەی هەیە.





## قەڵای کۆنی قەمچوقای

ئەم قەڵا کۆنە دەکەوێتە سەر شاخێکی بەرز بە دووری ٤٥ کیلۆمەتر لە باکووری بیجاڕ و ١٢ کیلۆمەتر لە گوندی قەمچوقای، هەڵکەوتە سروشتییەکەی وایکردووە ئەم قەڵایە گرنگی و گەورەیی تایبەتی هەبێت. بە لەبەرچاوگرتنی پاشماوەی دیوارەکانی قەڵاکە دروستکردنی پەیوەندی بە سەردەمی ساسانییەکانەوە هەیە.

## شاری هەورامانی تەخت

هەورامانی تەخت بە دووری ٦٥ کیلۆمەتر لە باشووری ڕۆژئاوای شاری سەوڵاوا هەڵکەوتووە و دیمەنی ئەم شارە زۆر سەرنجڕاکێشە نەك تەنها بەهۆی تەلارسازیی پلیکانەی جوانی خانووەکانییەوە، بەڵکو بەهۆی شێوەی هەرەمی شارەکەوە کە قەڵایەکی دێرینی لە سەرەوە هەیە. بەهای ئەم شارە لە چەند ڕوویەکەوە گرنگە، وەك مەراسیمی ساڵانەی پیر شالیار لە وەرزی بەهار و زستاندا کە بە درێژایی ساڵ میوانداری هەزاران گەشتیار دەکات وەك بۆنەیەکی گرنگی گەشتیاری.



## کانیاوی ئاوی کانزایی بڵ

کانیاوی ئاوی کانزایی بڵ دەکەوێتە ناوچەی هەورامان لەسەر سنووری پارێزگای کوردستان و کرماشان، تەنیشت دەریاچەی بەنداوی داریان. ئەم کانیاوە بە هۆی ئاوی خواردنەوەو ئاوی کانزایی لە جیهاندا زۆر بەناوبانگە. هەروەها دەکەوێتە سەر جوانترین ڕێگای گەشتیاری سروشتی لە پارێزگاکەدا.





## دەریاچەی زرێبار

ئەم دەریاچەیە بە گرنگترین تالاو و دەگمەنترین شوێنی سەرنجڕاکێشی ئاوی ڕۆژئاوای وڵات دادەنرێت، کە دەکەوێتە دوورییەکی کورت لە شاری مەریوان و لە بەرزی ١٢٨٥ مەتر لە ئاستی دەریاوە. دەریاچەکە بە شاخێك دەورە دراوە کە بە دارستان داپۆشراوە و جوانییەکەی زیاتر دەکات.

## شوێنی حاجی‌لەق لەقەکان
## (گوندی دەرە تفێ)

گوندی دەرە تفێ وەك یەكێك لە گوندە گەشتیارییەكان ساڵانە میوانداری هەزاران گەشتیار و سروشتدۆستانی كردووە، كە بە هۆی بوونی هێلانەی حاجی لەق لەقەكان كە لەلایەن خەڵك خۆیەوە دروستكراوە.

سروشتی جوانی گوندەكە و هەڵكەوتەكەی لەسەر ڕێڕەوی گەشتیاری سروشت، بوە بە هۆی سەردانی كردنی گەشتیاران بۆ ئەم گوندە جوانە.





## گوندی سەرسوڕهێنەری پالەنگان

ئەم گوندە گرنگترین گوندی گەشتیاریی ئەم پارێزگایەیە، کە بە دووری ٥٠ کیلۆمەتر لە باکووری ڕۆژئاوای شاری کامیاران لەسەر ڕێگای کامیاران بۆ مەریوان هەڵکەوتووە. ڕێگای هاتووچۆ بۆ ئەم گوندە قیرکراوە و پێکهاتەی گوندەکە لە ڕووی تەلارسازییەوە بە شیوە پلەکانی بنیاتنراوە و ڕووباری تەنگیوەر بە جوانیکی تایبەت گوندەکەی کردووە بە دوو بەش.







# گوندە گەشتیارییەکانی پارێزگای کوردستان

## گوندی بلبەر

– لە ٦٠ کیلۆمەتری جادەی مەریوان بۆ پاوە.

– شوێنیە گەشتیاریەکان : جادەی هەزار پێچ و دیمەنی جوانی گوند و ڕێڕەوی سروشتی .

– تەلارسازیی پلیکانەی خانووە لادێییەکان لە تایبەتمەندیکانی ئەم گوندە جوانەیە.

## گوندی دۆلاو

– لە ٤٢ کیلۆمەتری جادەی سنە بۆ کامیاران.

شوێنیە گەشتیاریەکان :

– تەلارسازی پلیکانە و کوچەباخی ژێر خانووەکان.

– دیمەنی زۆر جوانی گوندەکە و باخەکانی دەوروبەری.





## گوندی میانە

– لە ٧٥ کیلۆمەتری سنە بۆ مەریوان .

– ڕێگای چوونە ژوورەوە بۆ گوند لە ڕێگەی جادەی بەنداوی ئازادەوە، نزیك دەریاچەی بەنداوی ئازاد

## گوندی گەشتیاری ژیوار

– لە ٧٠ کیلۆمەتری جادەی مەریوان بۆ گوندی هەجیج (لە بناری چیای کۆسالان) .

– تەلارسازی پلیکانەی زۆر جوان، پترۆگلیفی کۆن.

## گوندی گەشتیاری دیوەزناو

لە ٧٧ کیلۆمەتری جادەی کامیاران بۆ مەریوان.

گرنگترین شوێنەگەشتیارییەکان:

- دیمەنە شاخاوییە زۆر جوانەکانی گوندەکە.
- سەنتەری کاری دەستی گوندنشین لە دەڤەری هەورامان.
- سەردانی کانیاوی زۆر گەورەی تێلۆکسان (یەکێک لە دەگمەنترین کانیاوی پڕ لە ئاو لە ئێران)،
- بوونی گەورەترین کومەلگەی ماسیگرتنی ئاوی سارد لە ئێران.







# ئاهەنگ و مەراسیمی تایبەت

## نـەورۆز

نـەورۆز گرنگتریـن ئاهەنگـی ڕۆشـنبیری و مێژوویـی خەڵکـی دەڤـەری کوردسـتانە و لـە زۆربـەی گوندەکانـدا بەشێوەیەکی خۆبەخۆ بەڕێوەدەچێت و ئـەم مەراسـیمە هەموو سـاڵێك بـە ئامادەبوونی گەشـتیاران بەڕێوەدەچێت.

دوو گوند کە ئاهەنگی نەورۆز بە تایبەتمەندیکی جیاوازەوە بەڕێوەدەچێت:

- نەورۆز لە گوندی پاڵەنگان
- نەورۆزی گوندی تەنگیسەر



## ڕێـوڕەسمی ساڵانەی هاوسەرگیری پیر شالیار

یەکێکی تر لەو ڕێوڕەسمانە کە لە نێو خەڵکی کوردستاندا جێگەی تایبەتی هەیە بەتایبەتی لە دەڤەری هەورامان، ڕێوڕەسمێك بە ناوی «زەماوەندی پیر شالیار» (ئاهەنگی هاوسەرگیری پیر شالیار) بەڕێوە دەچێت. ئاهەنگی هاوسەرگیری پیر شالیار یەکێکە لەو ئاهەنگە باوانەی کە هەموو ساڵێك دوای ٤٥ ڕۆژ لە سەرەتای وەرزی زستان واتە لە هەفتەی دووەمی مانگی بەهمەن بۆ ماوەی ٢ هەفتە لە گوندی هەورامان تەخت بەڕێوە دەچێت. ئەم مەراسیمە ساڵڕۆژی هاوسەرگیری پیرە پیاوێکی ئەفسانەییە بە ناوی «شالیار» کە ڕەگ و ڕیشەی لە ئەفسانە و بیروباوەڕ و ڕێوڕەسمە دێرینەکانی خەڵکی ئەم خاکەدا هەیە...



## مەراسیمی کۆمسای

لە ناوەڕاستی وەرزی بەهاردا کە هاوتایە لەگەڵ ١٥ی گوڵان، لە شوێنی گڵکۆی پیر شالیار کە نزیک گوندی هۆرامان تەختە، مەراسیمێك بە ناوی مەراسیمی کومسای بەڕێوە دەچێت. ساڵانە ژمارەیەکی زۆر لە گەشتیاران و هەروەها فۆتۆگرافەر و ڤیدیۆگرافەر و توێژەر و ژمارەیەك بیانی سەردانی ئەم بۆنەیە دەکەن.





## سنە شاری داهێنەرانەی مۆسیقا

بە هۆی بوونی پرۆفیسۆرانی مۆسیقا لەسەر ئاستی نێودەوڵەتی و ئەو پتانسێلە گەورەیەی کە لە بواری مۆسیقا لە شاری سنە هەیە، هەروەها بەڕێوەچوونی چەندین کۆنسێرتی مۆسیقا و بەرهەمهێنانی ئامێری مۆسیقا کە بە کاری دەستیی ئەو پارێزگایە ناسراون. شاری سنە لە ساڵی ٢٠١٩ لە ڕێکخراوی جیهانیی یونسکۆ وەك شاری داهێنەرانەی جیهانی مۆسیقا هەڵبژێردرا و ئەمەش بووەتە هۆی پەرەسەندنی زیاتری گەشتیاری و ناساندنی کوردستان، بەتایبەتی لە بواری گەشتیاری فەرهەنگی (گەشتیاری مۆسیقا) لە شاری سنە.

## مۆزەخانەی سنە

ئەم مۆزەخانەیە دەکەوێتە سەر شەقامی ئیمام، کۆڵانی حەبیبی.
پەنجەرەی ئۆروسی مۆزەخانەی سنە یەکێك لە نموونە ناوازەکانی هونەری ئۆروسی ئێران و کاری وەستاکانی سنەیە. ئەم کۆشکە یەکێکە لەو بینایانەی کە لە سەردەمی قاجاردا ماونەتەوە.



## مەریوان – شاری جیهانی کڵاش

گرنگترین بەرهەمی کاری دەستی مەریوان بریتییە لە کڵاش. کەڵاش پێڵاوێکی زۆر جوان و ئاسوودەیە و پێکهاتەکانی بەتەواوی لە سروشت وەرگیراون. مەریوان بەهۆی ناوەندی بەرهەمهێنانی پێڵاوی نەریتی خەڵکی کوردستان و بوونی زیاتر لە ٤٠٠٠ کەس کە بەشە جیاوازەکانی کڵاش بەرهەم دەهێنن لە ساڵی ٢٠١٦ لەلایەن شورای جیهانی کاری دەستی وەك شاری جیهانی پێڵاوی کڵاش هەڵبژێردرا.





## بەرهەمە خۆراکیەکان

گرنگترین شیرینی کە تایبەتە بە شاری سنە شیرینی کونجییە، شیرینیەکانی تر بریتین لە نانی برنجی، بادەم سووتاو، باسلوق.

جۆرێك لە شیرینی بە ناوی «کوماج» و جۆرێك حەلواسۆحانی لە شیرینییە ناوخۆییەکانی شاری بیجاڕن.

ناوەندی کڕینی ئەم بەرهەمە خوراکیانە لە شەقامی پیادەی فێردۆسی لە بەردەم سینەما بەهمەن هەڵکەوتووە.

## شلێک لە پارێزگای کوردستان

پارێزگای کوردستان گرنگترین و گەورەترین بەرهەمهێنەری میوەی شلێکی جوان و بەتامە. کاتی دروێنەکردنی شلێك پەیوەستە بە بەرزی شوێنەکە لە پارێزگای کوردستان، دەکرێت لە سەرەتای مانگی گوڵان تا کۆتایی مانگی پووشپەڕ بێت. یەکێك لە بەرنامەکانی گەشتە گەشتیارییەکان بوونی گەشتیارانە لە کێڵگەکانی شلێك، کە بانگهێشت دەکرێن بۆ هەڵگرتنی ئەم میوە جوان و ناوازەیە بە مەبەستی ئەزموونکردنی خۆشی دروێنەکردنی ئەم میوە بە تامە.





# KURDISTAN

**Tourism Attractions and Sightseeing of Kurdistsn Province**

بەشی گشتی میراتی ڕۆشنبیری و
گەشتوگوزار و کاری دەستی
پارێزگای کوردستان

ئەشکەوتی کۆنی کەرەفتو

**www.Kurdistan.ichto.ir**
**(+98) 87 - 33285725 - 26**